

# DU GAV PÊŞ YEK PAŞ

RAPORA LÊNIHÊRÎNÊ YA  
ÎHLALÊN MAFÎ YÊN KU  
WEŞANGERIYA ÇANDÎ YA KURDAN  
MARÛZÎ WAN MANE

( KURTEYEKE FIREH BO KURDÎ - KURMANCÎ )  
2020

# DU GAV PÊŞ YEK PAŞ

RAPORA LÊNIHÊRÎNÊ YA ÎHLALÊN MAFÎ  
YÊN KU WEŞANGERIYA ÇANDÎ YA  
KURDAN MARÛZÎ WAN MANE

## TÎMA LÊKOLÎNÊ :

Reha Ruhavioğlu  
Roj Girasun  
Emine Çoban

## SÊWIRAN : Archetype Creative

Ev weşan, di vegira **ETKÎNİZ** Bernameya YEyê de, bi piştgiriya  
fînansal ya **Yekîtiya Ewropayê** ve hatiye hilberîn. Bi tenê  
**Komeleya Xebatên Kurdî** ji naveroka vê weşanê berpirsyar e û bi  
ti awayî fikrên Yekîtiya Ewropayê nîşan nade.

# KURTEYEKE FIREH

## BO KURDÎ - KURMANCÎ

Pêvajoya çareseriyê ya ku di navbera salên 2013-15an de dewam kir, qada kamuyî ya kurdî berfireh kiribû û ev rewş di warê fêrbûna zimên û emilandina wê de jî vediyar bibû. Eleqe bo weşanên kurdî an jî yên li ser kurdan zêde bibû, weşangeriya çandî ya kurdan bi awayekî nisbî serdemeke baş derbas kiribû. Bes bi kutabûna pêvajoya çareseriyê û destpêkirina pevçûnan –vê carê li bajarên- re zehmetiyên mezin derketin holê û ji bo weşangeriya kurdan ev rewş salên 90î bi bîr dianî. Weşangeriya zimên û çandî ya ku tesîr ji serpêhatiya pirsgerêka kurdan ya li tirkîyeyê ku car bilind dibû car nizm dibû, werdigre, ji 2016an û vir ve zehmetiyên têvel dijî û marûzî îhlalên mafî dimîne.

Weşangerên kurd yên rewşa çend salên dawî ya weşangeriyê vedigêrin diyar dikin ku ji 2015-16an ve şert û merc "ber bi xerabiyê ve diçe" an jî "sabit" e. Di nav sedemên vê sabitbûnê de tesîra krîmînalîzekirina zimên heye ku bi kutabûna pêvajoya çareseriyê û destpêbûna pevçûnan re têkildar e. Wek mînak Weşanên Aramê ya ku ji avabûna xwe û vir ve hindêk pirtûkên wê hatine qedexekirin, piştî pevçûnên 2015an û tayînên qeyyuman ve ket rewşeke nebaş. Dîsa piştî demeke dirêj di çend salên dawî de 15 pirtûkên Avestayê hatin qedexekirin.

Polîtîkaya sansurê ya ku di salên dawî de li tirkîyeyê hiştir û berbelavtir dibe, derfeta wê yekê nade û asteng dike ku rewşa vê komê ya ku bi sedema pêşveçûnên di peywenda pirsgerêka kurdan de tîn jiyîn, di peywendeke krîmînal de derpêş dibe, di qada çandî de rûbirûyî wê dimîne, bi berfirehî were qeydkirin. Xebatên lênihêrîne yên ku li qada çandî hûr dibin, îhlalên ku weşanxaneyên kurdan tûşî wan bûne jî vedihewîne û bertekên li dijî sansurê yên sazîyên mafên mirovan îhlalên têkildarî vê qadê jî dikirpîne bes biûtên îhlalê yên vê qadê û wêneyê rewşê bi giştî ji van xebatan baş nayê fêmkirin. Navenda Xebatên Kurdî jî vê pêwîstiyê hereket kir û di derbarê weşangeriya çandî ya kurdan de raporek amade kir.

"Rapora Lênihêrîna li Îhlalên Mafî yên ku Weşangeriya Çandî ya Kurdan Marûzî Wê Maye", bi sernava xwe ya DU GAV PÊŞ YEK PAŞ ve bi armanca şayesandina rewşa weşangeriya çandî ya kurdan, ji nêz ve dîtina zehmetiyên ku dijî û nîşandana îhlalên mafî yên ku marûzî wan maye, bala raya giştî bikêşîne ser vê qadê û bo nîqaşkirina pêşniyazên çareseriyê, bi paşvegera beşdarvanan re gihîşt halê xwe yê dawî.

Lênihêrîna ku di vê xebatê de hate kirin; di serî de azadiya derbirîne û qedexeya cudakariyê, mafên komên etnîk û çandî dixê navendê. Di vê peywendê de lênihêrîn; qedexeya cudakariyê, mafên wekî azadiya derbirîne û standardên di xwe de dihewîne xwe dispêre peymanên bingehîn yên wekî "Peymana Navneteweyî ya Têkildarî Jiholêrakirina Her Cure Cudakariyên Nijadî", "Peymana Navneteweyî ya Mafên Şexsî û Siyasî", "Peymana Mafên Mirovan ya Ewropayê" û "Beyannameya Gerdûnî ya Neteweyên Yekbûyî" û normên sazîyên wekî Teşkilata Hevkarî û Ewlehiyê ya Ewropayê (THEE).

Di vegira xebatê de li gel sehkirina medyayê û nixandina dosyayên dozan, bi nûnerên weşanxaneyan re û bi aktorên ku têkildarî qadê pisporyên wan hene re, bi giştî daneyên ku 16 hevdîtînen kûr hatin bi destxistin, hatin analîzkirin.

Nûnerên weşanxaneyan yên ku beşdarî lêkolînê bûn, dîroka weşangeriya çandî ya kurdan wekî serpêhatiyê ji serdema osmaniyan ve heta îro dinirxînin û di vê rêvingiyê de ji çend duryanên bingehîn derbas dibin. Ev rêvingiya ku di serdema dawî ya osmaniyan de ku wê demê matbaa bi awayekî çalak dihat emilandin û serdemên Meşrûtiyetê ku sansur sist bibû, dest pê bûye, ji salên ewil yên komarê û pê de tûşî qutbûneke dirêj dibe.

Berî 1980yî bi livdarbûna qada siyasî re weşangeriya kurdan jî vediyar dibe, bi taybetî heta nîvê salên 90î weşanxaneyên ku karên weşangeriya çandî ya kurdan dikin bi piranî di hîmayeya komeke siyasî, îdeolojîk an jî olî de dixuyên.

Darbeya 1980yî, bi taybetî di sepanên asîmîlasyonê yên ku kurdî dikin armanc de, dikare wekî duryanekê were bi bîr anîn. Yasaya di Derbarê Weşanên ku ji bilî Tirkî dê Werin Kirin ku ji hêla rêvebiriya leşkerî ve di sala 1983an de hatibû derxistin, bi kirpandina "Ji bilî Zimanên Yekem yê Fermî yên Dewletên ku Dewleta Tirkan Ew Naskirine, bi Zimanekî Din Ravekirin, Belavkirin û Weşandina Fikran Qedexe ye" re, weşana bi kurdî asteng dike.

Piştî ku Özal bû serokkomar, beyanên wî yên têkildarî çareserkirina pirsgerêka kurdan, dibe gavên ewil yên girîng di warê girtina serdema ku kurd û kurdî tune dihatin qebûl kirin. Asoxîn ev pêvajoyê, bi rakirina yasaya navborî û astengiyên ku bi vê yasayê re li pêş kurdî hatibûn danîn, bi encam dibe. Tebîtîna ku weşangeriya kurdî ya ji osmaniyan û vir ve di vê serdemê de cihê xwe ji bilindbûnê re dihêle.

Yek ji encamên bingehîn yên rapora Weşangeriya Çandî ya Kurdan ew e ku serdema herî rewnaq ya weşangeriya kurdan ya li tirkîyê, ew serdem e ya ku wekî "Pêvajoya Çareseriyê" dihat binavkirin. Weşangeriya kurdan ya ku heta salên 2000î geremolên têvel jiya, di pêvajoya çareseriyê ya 2013-15an de gihîşt qada herî fireh ya tesîrê bes bi destpêkirina pevçûnan re tesîr û vediyariya wê kêr bûye. Ev serdem di heman demê de bûye destpêka serdema berhevkerina pirtûkan, qedexekirin û dijarbûna çapkirin, belavkirin û beşdarbûna fuaran û fişarên yasayî yên ku ji nû ve tên dîtin.

Pêkan e ku îhlalên mafî yên di encama lênihêrînê de derketin holê, di çend sernavan de werin senifandin:

**Cudakarî û îhlalên di qada çapkirin û belavkirinê de derdikevin,** wekî pirsgerêka berdewam ya weşangeriya kurdî derdikeve pêş. Helwesta şîrketên belavkirinê, ya zincîreyên mezin yên pirtûkan û ya malperên pirtûkan bi şiklê ku berhemên wan weşanxaneyan "dernexin pêş" hevpar dibin. Bi paşdehatina berhemên ku bi rêya PTTyê tên şandin wekî pirsgerêke ku ji salên 90î berdewan dike, derdikeve pêş.

**Tê dîtin ku KHK û tayînkirina qeyûman bo şaredariyan,** bi şêweyên têvel tesîra neyînî li weşangeriya kurdî dike. Sepanên wekî dijarîya beşdarbûna weşanxaneyên kurdan bo fuarên pirtûkan yên ku ji hêla şaredariyan ve tên lidarxistin, rakirina pirtûkên kurdî ji pirtûkxaneyên şaredariyan û girtina kreşên kurdî, vediyariya zimên kêr dikin û li hêla din, ji ber ku personelên kamuyê yên ku bi KHKyê ve hatine îxrac kirin bi piranî mezaxkerên vê qadê ne, tê fêmkirin ku weşangerî ji vê hêlê ve jî bi awayekî neyînî tesîrê digre.

**Pirsgerêk û îhlalên ku di beşdariya fuarên pirtûkan de tên jiyîn,** wekî qadeke din ya ku tesîrê li zêîfbûna weşanxaneyên kurdan dike, diyar dibe. Venexwendina bo fuaran ya weşanxaneyên ku di vê serdemê de ji hêzê dikevin, nepejirandina serîlêdanên wan yên beşdarbûnê an jî heke serîlêdana wan hatibe qebûl kirin, betalkirina di kêliya dawî de an jî guherandina cihên wan rewşa dezavantaj ya sektorê zexm dike.

**Cudakariya ku di piştgiriya Wezaretê Çandê de tê jiyîn,** di piştgiriya wekî "berhema ewil" de ji ber sedema zimanê berhemê divê tirkî be, bi şiklekî ku nivîskarên kurdan li derve bihêle, dest pê dike. Her wiha nestandina pirtûkên kurdî ji bo pirtûkxaneyên girêdayî wezaretê jî wekî dezavantajên vê qadê

derdikeve pêş. Wezaretê heta niha ji Avestayê bi tevahî 4 pirtûk sitendiye û tê dîtin ku bi tenê yek ji wan bi kurdî ye.

**Qedexekirin û berhevkirina pirtûkan,** yek ji wan mijarên ewil yên ku weşanxaneyên kurdan jê merezdarî ne. Li gor zanyariyên ku di vegira lênihêrîne de ji weşanxaneyan hatine bidestxistin, ji sala 2009an heta îro herî kêm 117 pirtûkên ku ji weşanxaneyên kurdan derçûne, hatine qedexekirin. Tê fêmkirin ku ji 100î zêdetirê van pirtûkên ku 102yên wê ji Weşanxaneya Aramê, 15ên wê ji Weşanxaneya Avestayê derçûne, piştî kutabûna pêvajoya çareseriyê hatine qedexekirin.

**Nedayîna pirtûkên ku bo girtiyan ji girtîgehan re hatine şandin,** hem ji hêla weşanxaneyan ve û hem jî ji hêla girtiyan ve wekî îhlaleke mafî diyar dibe. Nûnerên weşanxaneyan yên ku hevdiñtin bi wan re hatiye kirin parve dikin ku hema bêje temamê pirtûkên ku hatine desteserkirin û qedexekirin di avêtina ser malan de bi navê xwe, berga xwe û hwd. bala polîs kişandine an jî ew pirtûk in ku bo girtîgehan hatine şandin lê bo girtiyan nehatine dayîn. Weşanger parve dikin ku pirtûkên ku hejmara rûpelên wan zêde ne, piştî bo ewlehîyê tîr ragihandin bi 24 saetan ve tîr qedexekirin û nepêkan e ku di demeke ewqas kurt de ev pirtûk werin xwendin bes ji ber sedemên wekî "derçûna pirtûkan ji weşanxaneyên kurdan û îfadeyên wekî kurdistanê di xwe de dihevin" lezelez tîr qedexekirin.

**Fişareya yasayî ya berê wê li weşangeran** jî wekî qadeke îhlalê ya ku bi awayekî neyînî tesîrê li weşangeriya kurdan dike, derdikeve pêş. Li rex van sernavên ku li jor hatine hejmartin, cudakarî, fişare û îhlalên ku berê wan li weşangeriya kurdan e rasterast nivîskar û rêvebirên weşanxaneyan jî ji xwe re dikin armanc. Sepanên wekî binçavkirin û girtinê yên ku berê wan li weşangeran e jî dîsa bi tesîra atmosfera kutabûna pêvajoya çareseriyê re û bi destpêkirina pevçûnan re çêbûye, tîr meşandin. Xwedî îmtiyazê Weşanxaneya Avestayê, Abdullah Keskin û rêvebirê Weşanxaneya J&Jyê, Azad Zal di encama atmosfereke wiha de ji pêvajoyên yasayî hatin derbaskirin.

Piraniya biryarên lîpîrsîn, peygerî û qedexekirina pirtûkan bi sedema "sûcê propagandaya rêxistina terorê" tîr dayîn. Ev xal, îro di rewşeke wiha de ye ku li tirkîyê bûye amrazê ku çada azadiya derbirîne ya beşeke fireh yên wekî civaka sîvîl, siyasî û çapemeniyê teng dike û cezayê li wan dibire. Lê belê îhlal bi vî sînardar namîne, bo nimûne pirtûkên ku beriya avabûna PKKê hatine nivîsandin jî di lehê PKKê de wekî "propagandaya rêxistinê" tîr nixandî ku ev yek dibe nîşaneyek girîng bo keyfîbûna awayê bikaranîna vî rêbazê.

Dema li îhlalên ku li jor hewl hat dayîn ku werin senifandin û di raporê de hatin hûrgilîkirin, tê nihêrîn; tê fêmkirin ku mafên weşangeriya kurdan ya ku bi peymanên navneteweyî hatine destberîkirin, bi îhlalkirinê re tîr mexdûrkirin.

Bo nimûne; bêyî hebûna delîlên şênber, bêyî ku "propagandaya rêxistinê" bikin, darizandina weşangeran ji vî sûcî, tê wateya îhlalkirina destberîya "ti kes, ji ber emel û îhmaleke ku dema kirinê de li gor hiqûqa neteweyî an jî navneteweyî nabe sûc, nabe ku wekî sûcdar were dîtin" ku di Peymana Navneteweyî ya Mafên Medenî û Siyasî de tê kirpandin. Dîsa piştgirîdana tenê bo tirkî û hema bêje nestandina berheman ji weşanxaneyên kurdan ji hêla wezaretê çandê ve, îhlala regeza "wekhevîyê" ya di destûra T.Cyê de hatiye destberîkirin, pêk tîr. Li hêla din di vî serdemê de tê fêmkirin ku helwesta tîrkî kurdî, xala 7em ya Jiholêrakirina Her Cure Cudakariya Nijadî ya Peymana Navneteweyî û xalên 18-22em yên Beyannameya Gerdûnî ya NYyê ya ku azadiya bawerî û derbirîne û belavkirina fikran û mafên çandî destber dike, îhlal dike. Li gel vî yekê bi taybetî helwesta PTTyê û dijwarî û astengiyên ku di fuaran de li dijî weşangeriya kurdan tîr derxistin, tê wateya îhlalkirina "mafê bidestxistin û gihandinê" ku bi Peymana Mafên Medenî û Siyasî ya Navneteweyî de hatiye destberîkirin.

....

Ji lewre, tê dîtin ku, weşanxaneyên ku di pêvajoya çareseriyê de “serdema zêrîn” ya weşangeriya kurdî dijiyan, bi destpêkirina pevçûnan re dîsa ketine serdema dijarî, cudakarî û îhlalan. Li gor vê yekê, li tirkîyeyê bo pêşketina weşangeriya kurdan û tune kirina dijarîyên ku hatine jiyîn avêtina çend gavan girîng e.

Dersên bijare yên kurdî yên ku di dibistanan de tên dayîn bi sedema kêmbûna mamosteyan û ji ber vê yekê venebûna dersê, têra xwe fêdeyê nade. Dîsa, tê fêmkirin ku enstîtuyên kurdolojiyê yên ku bi navê Enstîtuya Zimanên Zindî hatin vekirin, piştî kutabûna Pêvajoya Çareseriyê zeîf bûne. Bo ku ev pirsgerêk û yên wekî wan dewam nekin dikare hindêk pêşniyazên çareseriyê werin berpêşkirin.

1. Zindîkirina bi navên xwe ya dersên bijare û van enstîtuyan dê hem tevkariyê li jîna kurdî û hem jî li pêşketina weşangeriya kurdan bike.
2. Di serî de sazîyên dewletê, rakirina sepanên ku cudakariyê dihevin, rakirina astengiyên heyî yên li pêşber kurdî, nixandina di vegira qedexeya cudakariyê de rewşên wekî qedexekirina keyfî, astengkirin û destberîkirina qedexeya cudakariyê, dê tevkariyê erênî li aştiya civakî bikin, dê tesîreke moralder, li ser raya giştî ya kurdan û cîhana weşangeriyê bike.
3. Wezareta Çandê û sazîyên girêdayî wê heke pirtûkên kurdî bistînin û têxin pirtûkxaneyên xwe, ev yek dê hem sektorê teşwîq bike hem jî dê tevkariyê li guherîna têgihana neyînî ya ku têkildarî kurdî hatiye saz kirin, bike.
4. Veguherîna di lehê azadiya derbirînê ya nêzîkbûna “propagandaya terorê” de ku nîqaşbar e û xebatên weşanxaneyên kurdan jî astengdar dike, bi qasî ku hiqûqê û mafên mirovan desteber bike, dê azadiya derbirînê ya qada ku bûye mijara raporê jî desteber bike.
5. Xebatîna têvel, nîşan didin ku beşeke girîng ya kurdan perwerdehiya pîrzimanî ya ku di bîngeha wê de perwerdehiya zimanê zikmakî heye, dixwazin. Naskirin û çalakkirina vî mafî, dê ji pêşdibistanê dest pê bike û emilandina kurdî zêde bike û ev rewş dê bi awayekî nerasterê tesîreke erênî li weşangeriyê bike.
6. Bi awayekî fermî pejirandina kurdî, bo zimên dayîna statuyêke destûrî, dê were wateya dabînkirina wekhevîyê di warê civakî û yasayî de û di warê çareserkirina pirsgerêkê de dê bibe gava herî girîng.

KURDISH  
//////STUDIES  
CENTER